# HÊVÎ Û JIYAN

Derwêş M. Ferho



Enstîtuya Kurdî ya Burukselê

Weşanên Pêrî

Derwêş M. FERHO

# HÊVÎ Û JIYAN

Helbest

Enstituya Kurdi Ya Bruksel ❁ Weşanên Pêrî

**Derwêş M. FERHO**

# HÊVÎ Û JIYAN

**Helbest**

Enstîtuya Kurdî ya Burukselê

Weşanên Pêrî

Weşanên Enstituya Kurdî Ya Brukselê
û
Weşanên Pêrî

Çapa yekem 1999

Pergala berg û rûpelan: Enstituya Kurdî ya Brukselê

Wêneya bergê: Behram Haco

Cilt: Yalçın Mücellit

Çap
Kayhan Matbaası

**D 1999 5799 24**
1999 / Publ. Nr. 24

Copyright
**Enstituya Kurdî ya Brukselê**
Rue Bonneelsstraat 16 -
1210 **Brussel-Bruxelles**
Belgium
**Tel.** 00 32 2 230 89 30,
**Fax.** 00 32 2 231 00 97
Bank Nr. 001 - 2068530 - 81

**Weşanên Pêrî**
Gureba Hüseyin Ağa Mah.
Dağarcık Sok.
Sultan Mehmet Han.
No: 32/26 **Fatih/İstanbul**
**Tel-Fax:** (0.212) 621 32 21

# NAVEROK


Pêşgotin 51
Kevoka Spî 7
Roj li Me Tarî ye 9
Ji Bo Gel 10
Jiyanek Din 11
Evîna Jiyanê 12
Daxwaza Min 13
Hêviya Min 14
Jina Bê Deng 15
Hebûna Me 16
Zarokên Kurd 20
Koledar 21
Tovê Me 22
Dilê Şkestî 23
Ez û Biyanî 24
Axîn 25
Ken Şerr û Jîn 27
Axa Min Xwîn Digirî 28
Evîna Ronahiyê 30
Ji Min Dipirsin 31
Welatek Di Xeyalên Min de 32
Lo Kurdo 33
Li Mala Zilmê 34
Sitrana Pêşkêşiyê 37
Gelê Serxweş Tacê Ronahiyê me 38
Hey Gelê Bindest 40
Welatê Dilbirînan 41
Memo Ye Tev Jîn 43
Ez Ev Ax Ev Ax Ez im 44
Ez Kurd im 45
Natirsim 46
Mirina Min Zor e 47
Derdê Me 48
Mala Tenhayiyê Wêran Bibe 50
Navnemir 51
Gav Bi Gav Meşa Me 52
Ronahiya Ramanê 53
Helbest 54
Daxwaz 55

Jana Evînê 56
Nêrînên Cida 57
Xewn 58
Çiyayên Me 59
Sûnda Şoreşê 60
Dijmin û Xezala Kurd 61
Hêviyên Azadiyê 62
Her Tişt Bo We 63
Dîcle 64
Evîna Di nava Min de 65
Hêviyên Şkestî 66
Evîn Û Hêvî 67
Here Ser Zilmê 68
Kom Dirabin Şahiyê 69
Em û Azadî 70
Em Jîn in 71
Yara Min 72
Ji Nêrîna Te Têr Nabim 73
Tu Û Welatê Li Ber Çavê Min 74
Welatê Li Duriyê 75
Hêvî û Xewn Li Welêt 76
Şerrê Me Kurdan 77
Zagona Xwezayê 78
Ez û Tu 79
Jîn Ji Nuh De Gul Divede 80
Kî Çi ye ? 81
Gotin Têr Nakin 82
Tarî û Ronahî Ji Me Gişan Re Ne 83
Pirsa Me 84
Gulên Jiyana Bedew 85
Penaber Di Reva Xwe De 86
Ax û Meriyên Me 87
Çemekî Ji Min Re Bineqişîne 88
Li Welatê Me 90
Du Gotin Ji Gerîlla 91
Em: Ez û Tu 92
Bihar e 93
Bav û Kalên Me Gotine 94

## KEVOKA SPÎ

Kevoka spî li jorê
bi fira xwe di bilindahiyê de
li bin konê asmanê şîn
bi birîndariya çengê xwe
li hêlînekê, nerm û bê tirs, digere

Dema tu liqasî wê kevokê bibî
birîna wê zêdetir kûr neke
berde, bila ew li rêya xwe here
loma ew, ne li gorê, lê li jînê digere

Eger şiphe ket dilê te jî
bêhnferehiyek bide ser dilê xwe
û li sitrana wê guhdarî bike
ku tu derd û kulên wê bibihîzî
çawa ew ji sedema evînê birîndar e

Eger şipha te hê jî ji dil ne çû
li çavên wê yên melûl binêre
gotinên zêrîn tev hêviyan xuya dikin
qet nebe wan bixwîne û bawer bike

"Ez çûkek im, hebûna min azadî
xewn û xeyalên min evîn û aştî
di nav agir de li hawîrdor
fira min ger e, hewar e, ya sitar
ku vê birînê ji dil û çeng biavêjim der"

Fira kevoka spî ne ji kêfa dil e
ew cih û war nahêle li paş
û dil nake çêlî bikin zare-zar
Dema cîhana di rohniya çavên wê de
bi kîn û şermezar agir pê ket
wê da rê ku bigerê li hêlîna bi rûmet

## ROJ LI ME TARÎ YE

Destên me hişk girêdayî
dil şikestî ye ji bêbextiyê
û çavên me, ber bi rojê
bi dijwariya demê re
    li ronahiya pey tariyê
ji kûrayiya dil, bi biryar digere

Dîroka min hevalê min bû
lê xêrnexwaz ketin nav hebûnê
û tariya jînê li ser min
di nava çiyayên min de
wek avê, ax û hewa ferz kirin

Hin caran rojê nabînim
tarî xuya ye hawîrdor
û birînên bîrên min dijwartir dibin
lê xeyal rohn, mîna stêrikên jor
bi hêviyên çiqas dûr jî
li benda bizrê avahiya xwe ne

## JI BO GEL

Îro şerr e
li ser naveroka gotinan
ku wan digot

Şerr giran e
ji ber ku wan di axaftinan de
kelîmên xwe maske kiribûn

Em ku ruyê me
li ber roj û tariyê vekirî
gotinên me zelal
nebin qurbanên doza wan

## JIYANEK DIN

Li dinyake din
jîyanek din dixwazim
ku meriv ne kîn, ne tirs
û ne êş dinasin

Li dinyake din
jiyanek din dixwazim
ku li wira meriv
hez ji hev bikin
û ne 'her tişt bo min' be

Li dinyake din
jiyanek din dixwazim
ku xweza hê paqij
şev û roj dostên hev
û hewa xweş e

Li dinyake din
jiyanek din dixwazim
ku ronahî û tarî
av û ax, nêr û mê
bêyî hev nikarin bijîn

## EVÎNA JIYANÊ

Ez bi hawar û xeml diqîrim
ez xwîna xwe dikelînim

Ji bela serê me
kevneperestên îroyîn re
bi hêviyên mezin
pirs dikim:
    axa min terk bikin

Ez ji bo vegera roja bê tirs
şerr û girî bi kulên giran
ji sedema talana mezin, li ser dilê şewitî
dayika bindest û xemgîn, diqîrim

Ez aştîyê bi zordarîya li ser xwe
çekên li dor min diteqin
û atomên li nav milkên cîranan
    jînê wêran dikin, nas nakim

Ez bi evîna xwe ya paqij
dizanim ku em hemî
    spî û reş, sor û zer
tev li axê divegerin
ne giring e li ku, ne jî çawa
ne dewlemend, ne jî bêwar
ne zordar, ne jî dîl
    zagona jînê weha ye

## DAXWAZA MIN

Ez di nav hêviyên ku hemî hêviyan
di nav çarçewa xwe de vedişêrê de me.
Di nav kêlîya ku hemî deman di nav
xwe de qeydkirî girtî û dijwariya hemî
kul û derd tê de nivîsî li ser canê min in.
Daxwaza min û jiyana min ewê bes
bi yek tiştî bextewar bibe: azadî.

Têgihiştina mecbûrî hin caran bi êş dibe.
Ne ku min weha xwest û bû, lê ji ber berberê
min ku dijî azadiya esasî ye, bi zora demê kir.
Ew ne ji bîr û baweriya meriv re qîmet
ne jî ji mafê meriv re hurmet dizane.
Çareya min dimîne, herçend ez pê dilêş im,
rahijim çekê û şerrê hebûn û nemanê bikim.

## HÊVIYA MIN

Ezê te dîsa ji kûrayiya dil
wan demên ku me ji hev bawer dikir
derd û kulên hev bi hêstiran derman dikir
û gava giriyê me ji bêriyê dihat
li ser çavên xwe qeyd bikim

Ezê dîsa di helbestan de
wê dema ku azadî di jiyana me de esas
û xemla hêviyan bi hezar rengî neqişkirî
ku hebûn xwedî qedrê bilind
û hemî xweşî tê de peyda dibû, binivîsim

## JINA BÊ DENG

Ew bi tenha
li ser zinarekî rûniştî bû
çavên wê di valahiyê de sar
kelegirî, westayî û dilşewitî

Ez nêzîk bûm: sedem çî ye?

Jina tenha
berê xwe da min
lê tiştek ne got
dîsa li ber xwe nêrî

Dîsa min pirsa xwe kir
wê carek din li min nêrî
ji ser zinar rabû
û ji min dûr ket
tenhayî jî
bêdengî jî bi xwe re bir

## HEBÛNA ME

Yek can, bû ye çar parçe
bi milyonan rih, bi milyonan birîn

Li bakur
navê demokrasî heye
zordarên demê xwedî text in
mîna robotên ji hesin li peytextê zilmê ne
û bi jehra Kemalîzmê mêjî û zik têr dikin

Feqih û mele, sofî û şêx, pîr û miftî
rehb û keşe û metran di kêf û tirsa xwe de
di bin kirasê şahesker de ji mirinê ditirsin

Can di êşkencan de, jîn di zîndanê de
û sola leşkerê Tirk, li ser sînga gel e

Xortên delal, bi pirranî sor
"kafir û gawir", dijminê namûsê tên dîtin

Herweha eşîrên îsyankar
gelê şoreşan, zimanê azadiyê dipeyivin
heta bi lalên xwe hînî axaftinê dikin
mêrxas û lewend mezin dibin
û kozikan xira dikin

Sehwa gerîlla li ser dijmin e
hêviyên jiyanê di dilê gel de ye
tarî ciyê xwe ji ronahiyê re dihêle
û stêrikê kurdan ji nuh ve dikenin

Li rojhilat
şahê zilmê çû, xelîfê zorê hat
dibistan bûn mizgeft, zarok hînê wehşetê bûn
kefen li xwe kirin, bi ser mirinê de revîn
êrîş birin ser milkê kurdan
mişk û mîro, ji wan hovan kêmtir ketin

Jinan, di bin çarşefên xwe de
pov veşartin, lê lotik avêtin
bi selewatan ketin kuçan
agirê cîhadê, bi şeytanê zemên re pê xistin

Keliha bedew, Dimdima navdar xwe parast
nav di merdên xwe da
Pêşmerge rakir ser piyan, tev cengawer û jîr
pey pîçên nûjen ketin, ji axa xwe qewirandin

Hînkarên Mehabadê, mendalan dighînin
xort jîyanek nuh û xweş, pîr bîrên xwe didnivîsin
ji dev dibêjin di civatan de
navên pêşmergên azadiyê, li ser sînga ezman
di mitika çiyan de nîşan dikin

Li jêrê welat, şêst sal e şerr, dîlan û şahî
zor û kîn, hêvî û êşkence bi hev re dijîn
şerrê azadiyê û xiyanet bi hev re dijîn

Kî ji peytext Bexda rabû, soz pekand
li ber ba çû, rû li xwe reş kir, xwe kir qirdik
gel xapand, hêvî xencer kir

Hin li xwe kirin agir, ew dilbirîn bûn
mêrxasên Kurd, birçiyên piçek azadî

Hin li dora xwe kom kirin
ew bûn virrekên zemên, duv celladên xwe çûn
geh lingên wan alîstin, geh serê malê hin sidqe dan
geh ew tewaf kirin, geh bi emir xelk kuştin

Hin ji wan ser dan
loma ew dikarîn xizmet bidin
tobe dereng ket, melîkê wan li wan hat xezebê
zora herdem, nîjadparêziya Ereb
hin kuştin, hin şewitandin
hin bi celladên xwe êşkence kirin
seqet, şaş û reben hiştin, kêm kesan li ber xwe dan
revîn, xwe parastin gelê berber, şervanên Kurd

Berê xwe bidin aliyê din
bi navê biratiyê, "wekheviya di sosyalîzmê de"
bîr di zîndanan de xwîn digirî, gel bi tirs
leşker xwedî emr e, muxbir du fils dikin

Çol û berrî û newal, çiya xweş heval in
çûk û lawir û meriv jî can hevra ne
di nav hêviyên xwe de di ronahiyê de dijîn

Ji Zozanên bilind, rê diçin çar aliyan
bê ku qereqolên leşker, leşkerê dewletên zilmê
karwanan rawestînin, jîn li wira xweş e

Keç xemilî, xort bedew in
bi hêviyên taze dijîn, şerrê xwe dikin
şehîdan didin
bûk hêstiran dirijînin, şehîdên xwe
di dilên xwe de diveşêrin

Ev e welat, çar parçe û tev birîn

## ZAROKÊN KURD

Bila agir bi hinavê felekê bikeve
ku di dema çavên van zarokan
tijî hêvî, hezê dixwazin, weha perîşan in

Ne dibistan, ne bijîjk, ne derman
û zik birçî, hezreta gezek nan
û pîvazek hişk, tiyê piçek ken in

Ew jî dibêjin em zarok in
û hêdî hêdî mezin dibin
bi van derdên mezin, bi hêvî
    bi tirsa cendirme di bin tava rojê de
    û hin caran wan bi qundaxên çekan
    di tariya nîvê şevê de şiyar dikin

Dema li ber çavên wan
namûsa hin kesan dibe çar pere
û axîna hin kesan, bi hezar kul
di bin destên xeddaran de
dilê wan parçe parçe dibe
lê jînê jî bi ma'rîfetên wê re nas dikin

## KOLEDAR

Ew bûn, dikuştin û bi kuştin jî gihan vira
ji rojhilat, ji rojava, ji jêr û jorê xwe hatin

Ew bûn, çav sor, ji xwînê têr ne dibûn
axa li ser kon divedan jî bi xwînê av dan

Hovîtî di xwînê de heye
nav û deng û nam û şan û qatil e
xapînok e, zor û diz e, pêzewenk e
Ew in hov, koledar, terezên çepel
bi top, bi tenq, bi bombe
û dibêjin rebenî 'qeder' e
belengazî para we ketî ye !
lê ew, ew çima têr nabin
û bêdengî û dinya
li zordariya wan dinêre !

## TOVÊ ME

Em in, ev gel
çawa tên kuştin
çawa tên dar ve kirin
dibînin û his dikin
roj bi roj, bi tarîx

Em in tazî
di bajar û gundan de
sed sal e jîn xeddar li me
azadiyê di falên stêrkan de
bi hêviyên rengareng dibînin
li meydana zilmê
û bi xwînê şûştî ne

Serhildan dil dive
zana û mêrxas pêwîst in
bi çend hezar şehîd, jîna azad
hember koledarên hov aqil dive
bîr dive û tovê me jî ew

## DILÊ ŞKESTÎ

Bi valahiya quncika evîna xwe
koçerî dikim
û kes nikare wê quncikê tijî bike

Bi dilekî şkestî
çiya-çiya, çol bi çol digerim
û dem nikare wî dilî razî bike

Bi tenhayiya xwe
ber bi ronahiyê rêvanî dikim
û ti kes wê tenhayiyê
        nikare ji ser milên min rake

Tim tenha, bi dilekî şkestî
lê tim bi evînek zelal
tim di bin êşkencan de
û tim bi birînek kûr
            melûl melûl jî me

Bê girî, ne tenha û bê êş
bi stêrikên di nav çavên xwe
di dilê xwe de ronahiya rojê dixwazim
delaliya şevê li bedena xwe biçênim
û di nav tîrêjên rengîn de
            govenda xwe bigrim

## EZ Û BIYANÎ

Min dest pê kir bi misilmanî bîr bikim
dibînim ku ew ji xwezaya min ya Kurdî
                    gelekî biyanî ye
dilê min yê dostaniyê jî di hezar cî de
                    birîndar bû
û ez jî hêdî hêdî ber bi hunda bûnê çûm

Ji aliyekî Ereb, ji yê din Tirk û bi ser de Pars
xwe bi kirasê Îslamê girtine
                    û bi werîsê nîjadparêziyê
di nav qumaşê demokrasiya rojava de pêça ne
dixwazin min jî di nav xwe de bixeniqînin

Lê ji bav û kalan de serekî minî hişk heye
ez rabûm û xwe bi axa sor paqij kir
li ber tembûra xwe sitran got
    û li ber kemançeya xwe govend girt
def û zirna min jî ew şahî bi dijwarî neqişand
dîsa ez di hebûna xwe ya Kurdî de mam

## AXÎN

Ev jîn giran e
tev bi birîn
    li ber xwe didim
ji janê hawar dikim
ji bêbextiyê diqîrim

Welat li ku ?
    yar li dûr
    dîlbera dil bi birîn
    ji sedsalan ve bindest
sed heyf li min
ez li xerîbiyê
xerîbî di nava min de

Agir ji sitrana min der tê
di evîna bê hêvî de
weha reben, bê dost
dilê min reben ma ye
xwîn tê da dikele
kerr, lal û şaş e

Bang û hawar e
ji ceger hil dibe, ji dil nale nal

Çiyayên min dikin qîrîn
Agirî serê xwe tewandî ye
di hezna jînê de
li Nemrûd dinêre
Nemrûd bi axîn e
û keliha Amedê, birîndar
dewran, şerm bike

Ez tev derd im
jîn jahr pê ketî ye
jîn tarî, xewn xerîb e

Hezar axîn
di bedena min de şîn bûwine
felek xayin e, mêrxasî rezîl
û li ser sînga min mexelî ye

## KEN
## ŞERR Û JÎN

Em dikarin di tenhayiya xwe de jî bikenin
geh li ser axa xwe, geh li dûrayiya biyanî
û di sitranên dîl de, bi xeyalên jînek delal

Em dizanin di rojên teng de jî rabin
hem hember dijminê aştî û azadiyê
hem ji bo dost û hevalên dîrokê

Em dizanin bi her dilsozî re bêjin
wek stêrikan li ezman geş û bedew
û daristanek tev gul û sosin rengareng

## AXA MIN XWÎN DIGIRÎ

Dema ez di rojeke şermdar de
serxwahr di rêve diçûm
wek diçûm gorna şehîdekî bi nav û deng
bi gotinên rezîl
xewna min kete ber çavên min
hînga min xwest ez bi gorn bibim
çardeh gav ax li ser min bibin kom
ku ez rojê qet nebînim
û her bi kurmên bi erq
marên kerrekor re şerr bikim

Ji xwe bipirsim
kî me ez, xwîn û xwîn
ne gulek sor di dara delal de
ne pîvitkek xweşik di erdê de şîn
û ne evîndarek dilsoz
ji evîndara xwe ya micewher
maç jî layiqê min nîne

Min gul anîn ber çavên xwe
bi hezar xewnên jînê
di nav bexçê evînê de
li bin heyva zelal
wek rojê ronahî zelal dide ew

Axîn dikeve ser dilê min
di vê tenhayiya xeddar de
bêdengî bo çi ji ser can naçe
roj weha dirêj, şev bê dawî
gelo ez
di navbera jîn û mirinê de me ?

Na, ev ne derba kêra nuh e
    laşê min diêşîne
    ne ji berê kor eli ser cegera min
ev derdê evînê ye min dikuje
rezîliyek şermdar e
tenhayî, bêdengî û mirina terez
hêvî bêçare bû ye
axa min xwîn digirî
ez jî xwe bi xwe dixum
kul ev e, ev e tiştê giran

## EVÎNA RONAHÎYÊ

Di hêviyên xwe de
dilteng ne be,          dinê li xwe ne gire
hêvî xurt, bê tirs, ceger hesin be

Çavên xwe bigire, ji aliyekî li xwe
ji aliyê din jî li jînê bifikire
bi bawerî be, di doza xwe de qewîn
destên xwe jî dirê jî rojê bike
ku tu li ber ronahiya wê
û di tariya şevê de, dilxweş be

Roj ronahî dide, tu jî evîna xwe
û bi hev re bikenin, her kêliya xwe
rengareng bineqişînin
hêviyan ava bikin û serbilind bijîn
xwe li hev bipêçin
loma dewran ranawestin
dema hun ji hev ne qetin
hêstirên çavan ji eşqê
loriyên dîlîniyê di dîrokê de
û evîna azadiyê geş bikin

Tu û roj, evîn û ronahî, dil û daxwaz
tofan û valahiya zeman, kîn û bêbextiyê
li ber hêza xwe dihelînin

## JI MIN DIPIRSIN

Ji min dipirsin
ji bo çi sitrana te girî ye?
min got: sedem xuya ye
her bosta axa min bi xwîn e
dinya alem jî dibîne

Ji min dipirsin
ev doza te ji bo çi ye?
min got: berhem xuya ye
ezê her sitran û helbesta xwe
bikim çeka hember zorê

Ji min dipirsin
ji bo çi şahiya te li dar e?
min got: sedem xuya ye
her dema derbas dibe
gavek ber bi azadiyê diçim

## WELATEK DI XEYALÊN MIN DE

Welatek di xeyalên min de ye
ku merov li wira jiyana xwe
weke ew dixwazin ava dikin

Welatek di xeyalên min de ye
ku merov li wira azadiyê bîr dijîn
û jiyan li ser bingehê evînê ava ye

Welatek di xeyalên min de ye
ku merov li wira sitranên xwe
ji helbesta ew hez dikin çê dikin

Welatek di xeyalên min de ye
ku li wira Zerdeşt û Îsa û Budha
Muhemed û Musa û Dawid
bi hevre dikarin fîlozofî bikin

## LO KURDO

Lo Kurdo agahdar be
    nexweşiyan nas bike
    birçîbûnê nas bike
    serhildanê jîndar bike
    xiyanetê rûreş bike
    aştî û azadiyê nîşan bike

Lo Kurdo agahdar be
    parsekî te nagihîne derekê
    koletî kadîna te tijî nake
    çavbirçîtî te têr nake
    zikreşî te çareserî nake
    tembelî te têr xew nake

Lo Kurdo agahdar be
    berxwedan te ji tiştekî nake
    dibe mêrxasî li te peyda bibe
    dibe şoreşa te pîrozî bibe
    dibe hebûna te bi ma'ne bibe
    dibe navê te bi nîşan bibe
    û jîna te ya tarî ronak bibe

## LI MALA ZILMÊ

Gava Şerefdîn ji xew şiyar dikin
çavsor li ser serê wî
copên zaliman di destan de
pîs pîs dikenin, dibê:
riho kîjan der biarihe?

Gava Şerefdîn ji cî radikin
bi tirs ji dil
çavên xwe li dor digerîne,
dîwarên mala zilmê, genî ne
her çar alî tîniyên xwînê
birçiyên axîna meriv, dibîne

Li piçek ronahî digere
pencera çarçewe
bostek û nîv fereh
li pey, bi dirêjî dirrabe
di hêt de kûr kutayî
naylonek qalin li ber
ji hundiru tevnik girtiye
ji derve zelqên çûkan li ser
tolaziyên xwe bi meriv dikin

Kînga hov
ji pelixandina canê Şerefdîn
diwestin, xewx li ku?
hewar di bêdengiya bêbext de
di mala zilmê de fetisî

Dema pelixandina rojêde, bê hiş dikeve
di hişyarbûnê de ji her demî zêdetir
bi baweriyeke qewîn dikeve nav xeyalên xweş
    li mal, di kêleka jina xwe de
    bê deng, nerm nerm razayî
    bîna Gulê dorê xweş dike
    pora wê li ser zembelîş belav e

Di mala zilmê de
pişta xwe dide hêt ku bîna laşê wî jê tê
    bêriya cixareke kamaş dike
    ji titina binya gundê xwe
    herçend e bi zor tê pêçan
ziman zuwa ye, tilî qurumî
ziman jî, tilî jî û kaxeza cixarê jî bi xwîn in tev
û bi agirê ji kînê, cixare pê dikeve
    dumana wê bi ser dilê xwe de
    bi keser, çav tijî av, bi kul dikşîne

Roj tirs, kul û hîlet e
pelixandin û zor e
ciwaniya wê ketiye xeyalan
xwînê di ra de dikelîne
di sitranên xwe de
    ji keliha zilmê
    ber bi bilindahiya çiyan de diçe

Tîtî li ber siha darê
nêzî hêlîna xwe mexelî
li ber çemê Xabûr, di nav daristanê de
tev evîna xwe, Ferhad û Şîrîn
di çiyan de bi xweziyan dighine hev

Di mala zilmê de
li benda nameyekê ye Şerefdîn
bi çar çavan nûçe hêvî dike
bav e, bira ne, dê û xuşk in
    çi dikin dost û yar
gelo pismam dizanin
ku ew mîna se nan distîne
bîna şeta keran ji avê tê
sîr qedexe ye û balgih nîne
    gizlewêta nîvqetayî
    dixe bin serê xwe
jîn tarî ye, felek xayin

Qey dizanin heval
rojê deh caran dimire
û deh caran ji nuh sax dibe
                dipelixe
qîrêniyên dehên din
ji odeyên derdorê xwe dibihîze
nalîn ji dîwaran bilind dibin
dijmin zalim e, birîn jî bê derman

Lo gelê dîl, ev canê te ye
bi navê Şerefdîn
di bin nîrê zorê de dipelixe
rabe îsyan bike
bes e ev xewa terez
van destên qirêj hilîne ji ser xwe
û bêje, hey mala zilmê
bela reş li nav çavên te bikeve

## SITRANA PÊŞKÊŞIYÊ

Sitranekê ji bo kesê ku
bi mêhvandarî hat mala min
û dizane zimanê xwe çawa
û ji bo çi bi kar bîne
ji hezkirinê têr nebe
û ji êşandinê bi xwe êşê bistîne
bi hemî evîna xwe pêşkêş dikim

Helbestekê ji bo kesê ku
hêviyên min tim jîndar kirine
û dilşkestina min ji xwe re bar dîtiye,
û bi hatina xwe re tiştê lê digere
ku dibe ji zû de li pey e
bi dilekî xweş dibîne û distîne
bi hemî hunerê xwe pêşkêş dikim

Kî çi nav li ser hebe
kî çi reng pê re hebe
ne bingeha girîngiya xweşikbûnê ne
bîr û bawerî, kar û berhem
di pîvana kesan de pêwîstiyeke
û ji bo kesên xwe dayine xizmeta yên din
ezê bi hemî delaliya kilamê jê re bisitrênim

## GELÊ SERXWEŞ
## TACÊ RONAHIYÊ ME

Ez Mem im, bejna gel
ne giring e ji kîjan navçê me
ji Amedê, bajarê nûjen Diyarêbekir
ji serî ta binî
keliha min, diyariya birên min Ermenî?
tev Dîcle dîlokan li hev digerînin

Ji Kirmanşah, Kerkûk û Rihayê
çen dhezar temenê min heye
Ji Mehabad, Tor û Serhed
Mêrdîn yan jî Zozanan
her yekî ji wan xwedî dîrokek rengîn
gula evînê me, weha nerm
xwîna min ji axa sor
koçerê çiya, sitrana azadiyê me

Min ew warê han parast
ji çar salan û vir de
ez im xwediyê dîrokê
dilê min bi ala rengîn ve
ji Zîna xwe re bi şahî govend dikim
û bi coyên avê re helbest dixwînim

Ez niha reben mayî
bi mirî û şehîdên xwe re tenha
lê bi sitran û helbestên şerr
bi çiya û çolên xwe re bê dost
û bi hêviyên xwe re di çaleke kûr de
pirr şerm e, pirr şerm dikim ji zemên
weke çila bê pirtik di nav birrên çûkan de
mêrxasî tev rastiyê di gorna tarî de
serê xwe tewandiye, bindestiyê diqîre

Ez im ev hêz, gelê serxweş
û li ser pelê jînê qeyda min heye
tacê ronahiyê, nîşana berxwedanê me

Belkî dewr û dewran dijminê min in
li ser axa min alîkariya neyar dikin
    neyarê evînê, dijminê wekheviyê
lê ez namirim, ez ev hebûn im
ev deşt û gelî, ev çol û berrî
ev zerya û kanî, ev daristan
û ev erda delal ji dostaniyê re nerm
    serbilindiya min in, milkê Kurdan
ji xweliya hestiyê min tov stendine

## HEY GELÊ BINDEST

Hey gel, gelê bindest
hezar sal êş, çar hezar sal
evîniya dîl ji dil, di laşê te de
kul bû ye çermê te

Hey gelê reben, fitîla dînamêtê pêxe
û bi ser cegera sebrê bikeve
ji bo parçe bibe, can nemîne
nav û deng, hebûn nemîne

Şerîtan, zincîran parçe bike
can bide mêrxasiyê
serî hilde, îsyan bike
bes e, bes e ev koletî
zilm bes e, bindestî şerm e
şerr ji şerr re, ceng ji cengê re
aqil ji aqil re, kîn ji kînê re

Zincîrên bindestiyê biqetîne
û azadî ji nuh ve bibîne, jînek delal
û dîroka qolinc û zikratan
li ser dil, wek tofanê xurt
û wek berê mahûzerê dijwar
di qebra zilmê de bitemirîne

## WELATÊ DILBIRÎNAN

Welatê dîl
dil bi hezar kul e
lê dîsa şîrîn
û tev evîn

Bi milyonan can
li ser te digirîn
evîna te bi wan re
û bi agirê azadiyê
bi tovê serxwebûnê
xwedî ne

Li ser axa te
axa zêrîn
gelek milyon jî
bi olê girtine
kî şêx e û kî mele
sofî û feqihên tolaz
tijî ne pîr û mirîd
tim û tim terez
weha jî dijmin

Li çiyayên te, bilind û şîn
Zozanên delal
û dilê te Behra Wanê
bi ronahiya rojê
bi şev stêrk
wan ji her alî dineqişînin

Tu xoşewîsta çeleng, welatê min
ev hezar sal e, ji bo azadiya dîl
dê zarok ji pêsîra xwe avetine
tev xwîn girîne, dîlok gotine
malbat têk çûn, hûr û gir
ji feleka xayin re rezîl ketin
ji bo te, welatê dilbirînan
axa qedîm, Kurdistana min

## MEMO YE
## TEV JÎN

Hey felek
çawa tu karî bejî ez merivperwer im
ger dilên zêrîn ji bedenan
ger cegerên bi xwîn ji nava merivan
û ger xwîna paqij ji canên belengaz
bi qêrîn, bi hewar, bi hêvî der biçe

Xort e
li serê çiyan e, navê wî Memo ye
yekî nenas lê bi çil dilî ye
xwedî çil ceger, li ser çil cîhanên rengîn
bi gul, li ser bedena hêviyê raza ye

Ew Memoş e, Mem e
ji welatê evîn kelepçe kirî ye
ji bedena gerdennasan hatiye
çavreş e, xwîn şêrîn e, delal e
di kunya mêrxasan de nivîsî ye
lê dil bi kul e, evîndar e
Kurd e, hez ji merivan dike
lê kî hez ji wî dike?

Ew Memo ye, ceng e
bi şev û bi roj bi azadiya welêt
pêşmerge ye
di jînê de çil hezar reng e
her rengek, xwedî birînên kûr!

## EZ EV AX
## EV AX EZ IM

Di welatê xwe de hatim jînê
ku jiyanan serfiraz bijîm
ne ji bo biyaniyên xwînmêj
min ji axa min derxin
yan li ser dilê min
axa bav û kalan talan bikin

Ez ev ax, ev ax ez im
evînî, dîlan û westan
nezanî û jîrbûn
tev ji vî canî ne
darên şîn, ewrên rengareng
çol û çiyan, zinar û kanî
keriyên lawiran, hebûn
şev û roj, jîn ji min e

Bêdengî, hewar û ronahî
di pêçavê min de, azadiyê diçirisînin
baş, xirab, min bo xwe
ev dinya nivîsî ye
bi hunerê van destan
li ser warê xwe

Loma
yek rê heye bo xwînmêjan
qirêj û gemara xwe ya sedsalan
li ser milên xwe bikin
û bi cehimin ji ser axa min

## EZ KURD IM

Ez Kurd im, di nav gişan de
bi dijwarî lê ser bilind
rê diparêzim
lê felek qehb, dinya dirû

Ez Kurd im, bi dengê bi birîn
nayême bihîztin, hey wax
çi dibe di vê dewranê de
ez diqîrim û hînga
dinya alem kerr e, kor e
tiştek nabihîze, bawer nake
wek helbestê
ku jehra mirinê têkeve
heyf, felek tu xayin

Her şeva min tarî
bi bablîsok û berf
her şeva min, reben
bi hezreta dema aza
bi kul û di destpêka şevê de
sitrana min ya tev jan
û şev bi wê sitranê
hê reştir dibe, bê hêvî

Ronahî xuya nake
roj stuxwahr, hêvî şermokî
di çiyayên bilind de temirî
maf hunda, namûs ji dest çûyî
di dawiya sedsala bîstan de
hewara terez jî kar nake

## NATIRSIM

Eger tu min bigirî
û destê min bi ben girê bidî
û pênûsa min ji dest bistînî
baş jî zincîr bikî
dîsa rajê titina qaçax ji berîka min
û devê min bi qepalê xwe bigirî
û êşkence bikî ta dikarî
di felaqê de û kursiyê cereyanê
canê min biêşînî, bê fêde ye

Eger can tev dirrabe be
di bin qamçiyê zilmê de
û xwîn ji çavan biherike
baş bizane ku di dil de
dîsa bi hezaran ber hene
ji bo çekên azadixwazan

Ez divim tu baş bizanê
sitrana min ya bi xwînê tê gotin
helbesta min ya bi kul tê nivîsîn
û derdê min yê giran
bi qirrêja şîrheramiya te naqedin
ezê her hebim

Çi bi neynûkên tiliyan
çi bi hestiyên birîndar
çi awir û hêstirên çavan
ji girtîgehê, ji zîndanê
bilind dibe ev dengê min
bê tirs û bê şik

## MIRINA MIN ZOR E

Axa min di bin ewran de hunda ye
û ji çar aliyan ve hov dizûrin
ne roj dixwaze ronahiyê bide milkê min
ne şev min di nav tariya xwe de diparêze
lê ez heme, mirina min jî zor e
tirsa neyar jî ji xwe ev e

Ji ronahiya rojê û tariya şevê
bê war im niha
reş û tarî li ser dinya min kom bû ne
û mal di bin ewrên reş û tarî de
zilma sedsalan dijî
lê namirim
ji ber ku hebûna min qewîn e

## DERDÊ MIN

Em reben ser çi diaxivin:
xwedan, nan û xêr
nexweş û miriyên xwe
zordestiya li ser me
di xewn û xeyalan de
di civatê de şev û roj
kul û derd û berberî

Li dor agir, Xwedan mezin e
jîn û mirin, cin û perî
cîhan û stêr, şev û roj
tev wî çê kiriye, ew hebûn e

Zikê me rebvenan birçî ye
nan ji bîra me naçe
û ji bo nanê zarokan
goştê destê me bi erdê ve
xwehdan li ser zinaran dimîne
xêr û fitre jî
nîvê her geza nanê me ye

Gava nexweşê me
di nav livînên xwe de dinalin
bîra me naçe ser bijîjkan
em dibezin şekirê qulorîk
û mew¯îjên di binê kuwarê de
hebûna xwe dikin xêr
ku Xwedê qebûl bike
û nexweşê me sax ke

Eger ew mir
êdî qeder e, çare nîne
ji malê re kutilk û dolma dikşînin
şêx û pîr ji bîr nakin
heta ku bismillahek û çar elhemdan bikşînin

Ji aliyê din
zordestiya mezin her dom dike
di malê de, li kar, di xewnan de
lêdan û kuştin û bêş
bû ne kulên ser dilên me
û bi ser de
serê me tim tewandî
niza&nim emê kînga biteqin
û dawiya vê jîna terez bînin

## MALA TENHAYIYÊ WÊRAN BIBE

Kes bawer nake
ku ez di bin darê kindirê de
û berê mahûzerê tême kuştin
jîn qet û qet ne xweş e

Herçend e birînên min
li ser canê minkûr
weha taze û xuya ne
û sitranên min
tev ji kul dipejirin

Helbestên min hewar in
navê min jî diyar e
li ser her rûpelê dîrokê
lê tenha me, ew wêran be
cîhan bê deng e

Lo, ew fêhr nabin
ku ez jî wek wan merov im
ez bi xwe ez
lê dîsa birê bira me
Kurd im, aştîxwaz û mêrxas
dostê dilxwaz
hevalê dilsoz im

## NAVNEMIR

Dengê tembûrê û kemançê
dime-dima daholê, lîle-lîla zirnê
dengê naqosê, azana melê
ewt-ewta kûçikan, zirrêna keran
bidin rawestan û laşê şehîd
têxin pêşya xwe, bi bêdengî veşêrin

Bila çûk nefirin, sitranên xwe nebêjin
jiyan li erdê rawestê û serî bê tewandinê
û ji kevokên sipî hêvî bikin
li gerdena xwe navê şehîd binivîsin: navnemir

Ew derba kuştina min bû, berê kor
ji Bakur, ji Başûr, ji Rojhilat û Rojava
ew xêrnexwaziya hember min bû
dijî ronahiya min, dijî evîna min
û stêrikan xwe kerr kirî ye
heyv sertewandî, roj şermezar
zerya li axê, ax li ezman dikin qêrîn
loma, ew hêviya min ku ji dilê wan e
birîndar, dilşikestî û bêgoman e

## GAV BI GAV
## MEŞA ME

Sal dîsa ber bi qedandinê diçe
hêdî hêdî, gav bi gav, bi nazikî
dawiya rojên meha Kanûnê nêz dibin

Çi di bin ronahiya rojê de
çi di tariya şevê de
şopa kevn ya demsalê hunda dibe
ew rojên kevn, nûka bes di bîran de

Ji berê, ber bi nuh de, ev guhertin
gaveke xwezayî ye
mîna gav bi gav meşa me
ber bi azadiya hebûna me tevan

## RONAHIYA RAMANÊ

Li hêviya rojên bê derd û kul nerawesta
wan ava bike di dilê xwe de bi hêrs
û li hêviya şahiyan neraweste bê goman
wan di bin ronahiya rojê de li darxe bi xweşî

Li hêviya qedr û qîmetê kesan neraweste
wan ji dilê xwe şanî derdorê bike bi bawerî
û li hêviya şahbûnê neraweste bê sebr
wê ji kûrayiya dilê xwe rengîn bike

Li hêviya rojên ronak neraweste
wan bi hêza hebûna xwe jîndar bike
û li hêviya rastiya xwe neraweste
wê bi gotin û zanîna xwe nîşan bike bê şik

## HELBEST

Helbest daxwazeke kurt e
ku ji dijwariyekê dipijirê
û ji giraniya pirsan
gelek ma'ne diqurpîne
mûcîzeyek di tariyê de
bi zimanekî sade û delal
daxwazeke pirr rêçik e

## DAXWAZ

Eger meriv xwe di bin lihêfê de veşêre
daxwaz: were xwe li kêleka min dirêj bike

Eger tu berê xwe biguherê û herê
daxwaz: li pey min were

Eger tu bi zimanekî zelal bêjî
ez hez ji te dikim
daxwaz: tu jî hez ji min dikî?

Eger tu bêjî ez çi difikirim
û ez ji te re derdê xwe bêjim
daxwaz: ji dil dostaniya te dixwazim

## JANA EVÎNÊ

Na, ev ne evînî ye, xeyalek vala ye
destên min, hêdî hêdî, bi tirs
li ser sîngên te digerin

Na ev ne evînî ye, di eynî demê de
ronak e û tarî ye jî
weha nertm, mîna sîngên te
weha hişk, mîna gotinên te

Na, ev ne evînî ye, ew dil
geh geş, geh pirnisî
çavên te, geh ji evînê diçirisin
geh kele-girî dibin

Na, ev ne evînî ye, loma, ne birîn
bê derman dibe, ne jî dijwartir
lê belê jana li ser dil
hey hawar, bê dawî û tûj dike

## NÊRÎNÊN CIDA

Em biçavên xwe, erdê dibînin
diqelişe, dişewite
lê kor û bê dilşewat, înkar dikin
    ku şerr dest pê dike
    û aştî nabe bibe
    ku merov merovan dikujin
    û em ew merov in

Em ku dikarin hêjî bijîn
bi hêvî û bê tirs
di nav lepên zaliman de
ku ji hebûna me aciz in
    û ew li serê me bela
    wek qûncirran, stirî û dirrih
    agirê dijwar û êş
    ji wan der tê

Em qet ji bîr nakin
bo çi em hene
ku di zanîna me de kûr
    ronahiya delal kok dide
    ku di nava me de hêvî
    li ser erda me ya ciwan
    bo dinya rengîn, bê zor
    jîn ji nuh ava dibe

## XEWN

Şeva din, li Diyarbekrê
di xewna xwe de, li piçek hêvî
û li piçekî ronahî digeriyam

Mal werane, xanî tev xirabe
û min didît ku bajar
mîna şkêreke ji keviran
bi ser hev de xureha ye

Gelo dinya hêja ye?
ku ev bajar ne bes di xwenê de
lê bi rastî, kuçe, xanî, kela navdar
bi kîn, di bin darê zorê de
tev jan, tev derd, tev dîl in

## ÇIYAYÊN ME

Van çiyan di sedsalê de
deng veşartine, dîrok qurpandine
ku îro fêhrî bêdengiyê bibin?
ne dengê çûkan, ne teqîna çekan
ne jî nalîn dibe kerr bibin

Ber di zinaran de
ber di zikê axê de temirî ne
û pelên daran şahidên berxwedanê ne
zûrik bi hêstirên hêviyan têr in

Di hêla van çiyan de
li ser sîngên bajarên delal
girtîgehên zorê ava bûne
çûk li ser dirrabên penceran dideynin
li ber çavên girtiyên xwedî bîr
li aliyekî can birîndar, dişewite, darihe
li aliyê din kîn û hêvî bi hev re
dil ji bo azadiyê dijîn

## SÛNDA ŞOREŞÊ

Ji bo azadiyê, sûnda mezin
li ser bedena min neqişî ye

Li ber bayê reş
di sînga çiyayê Kurdî de
li nav kûriya zeryaya Wanê
di sitranên min de
di Tora Medan de neqişî ye

Di hemberê bêhêvîtiyê de
bi kaniyên ji Agirî tên jêr
û di hêstirên ji çavên gelê min de
di dilê pêşmergan
û zincîrên girtiyên mêrxas
bi hezar rengî, bi hezar dilî
bi ala şerefê re li jor e

## DIJMIN Û XEZALA KURD

Xezal rabû bi ser çiyan ket
dijmin da pey, wê gav xurt kir
şaş ma, ji qerem bû

Xezal nalî qêrîn pê ket
çavên belek l'yê pey xwe kir
dilê reben çar parçe bû

Xezal bang kir, dor hêrs pê ket
ezman reş, çiyan îsyan kir
zirav li dijmin zor bû

Xezal xwe l'hev da hev
dijmin xapand xwe ji ber çav kir
kula wî di qirikê de zuwa bû

## HÊVIYÊN AZADIYÊ

Bi ronahiya rojê
an jî di bin tava heyvê de
li ber spehîbûna stêrikan
an bi agirê rojê
di rojekê ji yên havînên germ de
ewê azadî werê meyandin

Kîn e ew
di dilê min de jî ji îsotê tûjtir
xerab e, har e, peritiye
di zîndanên îroyîn de
ku li meydanên bênamûsan belav in
axîn lawik, lawik derd in
û ji hêviyan qut nabin
evîn weke ya gul û bilbil e
ez azadiyê dixwazim

## HER TIŞT BO WE

Bo we, bira û xuşkên min
her tişt bo we, şev û roj
ronahî, delaliya heyvê
û stêrikên şevê, giş bo we

Hêviyên rengîn, zanayî û xweşî
saxî û ken, govend û sitran
dîlan û leylan, giş bo we

Germ û sarî, hişk û nerm
çiya û, çol, gol û zerya
erd û ezman, evîn bo we

Westandina rojê, derd û kul
xwehdanan ji pêçav tê jêr
qîrîna bilind û axîna kûr
û evîna welêt, giş bo we

Berê kor, mîna pereng germ
ku ji devê mahûzeran difire
azadiyê mizgîn dike, giş bo we

Xweşî û dilxweşî, kêf û eşq
ne zîndan û ne êşkence
ne zor û ne zorbe, giş bo we

## DÎCLE

Dîcle, tu qet nawestî
ji herka tim û timî
ji derd û kul, ji zilm û pelixandinê
li kêleka te, li nav axa Kurdan

Di bedena te de, hêvî şîn nabin qet!
weha xurt, weke gurre-gurra ava te
rêça bê serî, li nav milkê li ber pekan

Dîcle, ma dilê te naêşihê
ji ber hêstirên bi xwîn
ku zarok û jin, xort û pîrên dora te
şev û roj, bi ser te de dibarînin

Nexweşî û birîn bê derman in niha
li ser axa tu tê re diherikê
ew ax li benda qêrîna te ye ey Dîcle
dê bi hêvî, zarok birçiyê jîna aza

## EVÎNA DI NAVA MIN DE

Evînek di nava min de
mîna delaltirîn stêrka li asmên
bi bayê azadiyê re gfovendê dike
û bi jînê re dev bi ken

Evînek di nava min de
mîna rojê ronak
û ronahiyê didê tiştan
tenha ye, zelal û ciwan

Evînek di nava min de
mîna şev û rojê, tev jîn
hêvî jê diçirisin
û bi zemên re sohbet dike

## HÊVIYÊN ŞKESTÎ

Here dayê
    ev elem e
bi laş û canê min girtî ye

Agirê êtûnê weha
ne germ
        û ne jî har e

Diêşe dilê min
    ji evînê
        ji tenhayiyê
            ji bêkesiyê

Ne xewn xweş
        ne hêvî xurt

## EVÎN Û HÊVÎ

Çi ji evînê xweştir
çi ji bîriyê dijwartir
çi ji hêviyê bedewtir
çi ji jînê xêrtir heye?

Evîna min kelepçe kirî
bîriya min qedexe ye
hêviya min mahkûm e
jîna min birîndar e

Çi ye çare, çi ye derman
ne şên girtin û ne xem
ne nezanîn e û ne girîn
ne jî gazin û pepûkî

Zanyarî ye
        ji meriv re bê evîn
xweşî ye
    ji her kesî re bê sînor
ji hev hezkirin e
            bêyî kumreşî
pêşveçûn e
        di xizmeta jînê de

## HERE SER ZILMÊ

Şiyar be
    bi kîna xwe
    kîna bê deng
    tûj û xeter
bi hêviyên xwe
hêviyên kevn

Dengê sitranên te
ji dengê çekên dijminê azadiyê
mezintir û bi hêztir e
bê tirs biçe ser wan, bi hêrs

Tu canpola yî
    bi agirê zorê
        pijiya yî

Rabe ser xwe
    bi awirên dijwar
    baweriya xurt
    û şerrê xwe yê jînê
here ser hîmê zilmê

## KOM DIRABIN ŞAHIYÊ

Ezê çîroka xwe binivîsim
herçend e gelê min bi çavên xwe
                    yên nexwende
nikare bixwîne û vê birîna kevn
lê ew gel ku ew çîrok û dîrok çê kiriye
ew gel e ku di sitranên xwe de
vê dîliyê bi ser hebûna jînê de diqîre

Ewê rojek werê
            rê di ber de fereh dibe
û ba ber bi hedefê wî de bi dîlan diçe
û cotkar û klarker û xwendevan
tev de bi ken, bi sitran, bi leylan dijîn

Ewê kom rabin şahiyê
    bilbil ji aliyekî ve, kew ji aliyê din
ozanên me ewê sitranên xwe bisitrînin
û dê weledên xwe li ser sîngên xwe deynin
ewê evîndar bi xoşewîstên xwe şah bin
tembûrvan jî ewê têlên tembûrên xwe birielînin
û welatê min, ji nuh ve ava dibe, tev neqişî

## EM Û AZADÎ

Kî vê rojê dikare paqij bikê
qirêja sedsalên dîl
        û birînên li ser dil
kî dikare derman bikê
birînên bindestiya sedsalan

Bi hêviyên merovatiyê
                taze taze
tovê azadiyê bi çênê
di çavên ciwanên me de
wek rojê, evînê şîn bikê

Lê berî sibê
di hember zorbe de kîn biçênin
di erdê de, bi bayê xurt re
li ser dilê her ciwanê xwe
doza mezin qeyd bibê

Ev barê giran e
Tor e, Çol e, Botan û Berzan e
Helebce, li milkê Soran
                hesab divê
Amed e, Mehabad e û Dêrsîm
Xwîn digirîn, dil parçe parçe

Keliha Dimdimê di bîran de
rûhê Mêrxasê nemir
        di xwîna me de kok girtiye
Ji nuh ve gerek şîn bibê
gerek şîn bibê jîn, jîna bi evîn

## EM JÎN IN

Li wira, di nav çiyayên şîn de
gundên me ji çar şkeft û sê konan pêk tên

Li wira bi zar û zêçên delal
                    bi jin û kalên xwe re
ji tecrûbên salan têr, tev sewalê xwe
di nav xewn û xeyal, bîr û hêviyên rengîn
û hemî kul û derd û jana xwe de dijîn

Li wira em yek gund
            weke yek malbatê
bi yek dengî sitran, govend û dîlan dikin
derd û kulên rojê, jana jînê par dikin
Li wira, bi xwezayê re em jîn in

## YARA MIN

Di destê yara min de
destmala neqşê
di bênderê de
li bin siya darê rûniştî ye
tayên rengareng
di nav selika wê de
evîna xwe, giriyê rojê
axîna erdê
û bindestiya sedsalan
hûrik hûrik dineqişîne

## JI NÊRÎNA TE TÊR NABIM

Evîna min ji bo te weha xurt e ku ji nêrîna te têr nabim

dema ez xwe li kêleka te dirêj dikim û dinêrim
bes nefesstendina te bêdengiya şevê xera dike

dema li hember te dirûnim û li te dinêrim
bes tîrêjên çavên te tariya derdorê ronak dikin

Evîna min ji bo te weha xurt e ku gotin têra wesfê te nakin

dema bi te re bi rê ve diçim û li derdora te dinêrim
hebûn û nebûn tev li ber çavên min reş dibin

dema destê te digirim û bi wan şah dibim
gul ji hinarkên rûyê te bi kenê te re li ber min dikevin

Evîna min ji bo te weha xurt e ku jiyan bêyî te nayê bîra min

dema ez bedewiya çavên te û rojê didime ber hev
dilê min bi hezkirina minî rojê diêşe

dema ez bîr dikim ku rojekê te hunda bikim çi dibe
namûs û şeref li min haram, jiyanê bêyî te naxwazim

## TU Û WELATÊ LI BER ÇAVÊ MIN

Li te dinêrim welatek tê ber çavê min
hemî curreyên êşê xwe lê dayine hev
û dîtina dermanan gelekî çetin xuya ye

Li te guhdarî dikim welatekî dibihîzim
evîn û şahiya merovan ciyê xwe
ji birîna derd û kulên kûr re hiştine

Ji te re bi xemgîniyeke ji dil diaxivim
di çavên te di ronahiyeke zelal peyda dibe
lê dilê te di nava xwe de xwîn digirî

Tu dilê xwe yê şkestî ji min re divekî
hebûn di bin zilma dijminê te de dinalê
jiyana te parçe parçe li xwe guhdar nîne

## WELATÊ LI DURIYÊ

Welatê li duriyê, mîna stêrikek çirmisî
li azmanê bilind dike hunda bibe
çawa ronahiya rojê di ber êvarê de
hêdî hêdî ciyê xwe ji tariyê re dihêle,
û ew kenê rojê bi bêdengiyeke kûr
bi tirsa hewderketinê reng diguhere

Welatê di dilê me de bi rengên bedew
di nava buhuşta rojan û sebra şevan de
bi çavên hoste û destên bi huner
bi zimanê Kurdî, govend û dîlana xwe
bi evîna Mem û Zînê hatiye neqişandin

Welatê ku em heta doh lê serbilind dijiyan
îro bi hezar birînî re bê derman e
li her çar aliyan zilm û talana bê sînor
em jî di nav de mîna kewên ribatê li ber hev
bi çekên dijmin şidandî, hevûdin dikujin

Ev çi ye li ser serê me kom bûye tohmet
di xwîna me de şiyar nabe rûhê Kurdî
ku em bikaribin ji her lîstika dijmin re bêjin
'bes e ev xapandin û talana te li ser milê min'
here ji vir dur keve, dur keve û bes te bibînim
û ji nuh ve jiyaneke bedew li vira ava bikim

## HÊVÎ Û XEWN LI WELÊT

Li wira bûm, bi hemî kul û derd
lê bi dilekî xweş, ken û girî, min
li ronahiya di tariyê de xuya, dinêrî.

Ew ronahî, şahidê dîroka min, ax
hebûn û sitrana min e. Ez wê baş
dinasim û ew jî min wek ku heme
ji ser û bin dizane. Em dost in.

Ji hinavê xwe, ji wê dûriya di nava
tariyê de, germa wê li ser canê xwe
dibihîzim. Jê re sitranekê dibêjim.

Çîroka me; xweşî û dijwarî, çiya û deşt
dawet û şahî, şên û xem, tev de, jê re
dikim rêz. Ew devbiken dibêjê: dizanim.

Daristan, asmanê şîn, şahbûna dilan
bextê reş û dijwariya em tê de
bi nêrîneke melûl, gotin bi gotin me got.

## ŞERRÊ ME KURDAN

Taca serê me Pêşmerge li Rojhilat û Başûr
pêncî sal e agirê şerrê azadiyê nedayine
vesandinê. Ev bû panzdeh sal jî li Bakur
Gerîlla mîna pilingê birîndar li dijmin dixe.

Destana qehremaniyê li her du hêlan, geh
bi herfên Erebî û geh jî bi herfên Latînî
rengareng, bi balkêşî, nazik û bedew dinivîsin.
Di navbera Dîcle û Firat de bi cî dikin.

Ne dijmin ne jî hevalbendên wan dizanin
çareseriya xelasiya wan li ku ye. Loma
gelê Kurd şerrê xwe bi her awayî, li her cî
û di her demê de dimîne. Bi ser dikeve.

Hêvî ew e Pêşmerge ji hêlekê û ji hêla din
Gerîlla ji nava himbêza gelê xwe hilpekin.
His yek be û ew jî kurdî be. Deng yek be
û ew jî kurdî be. Amanc jî azadiya kurdan be.

# ZAGONA XWEZAYÊ

Ev welatê bav û kalan ku ji min re mayiye ne pêşkêşî û ne jî mîrate ye.
Bi sînorê xwe ve ez û welatê xwe yak hebûn in. Loma ne welatê kesî yê
min e û ne jî welatê min dibê yê kesekî din. Ev zagona xwezayê ye.

Ez ji welatê xwe revîbim jî û nuka li ciyekî din bijîm nayê wê gotinê
ku ew êdî dibe welatê minî nuh. Loma ezê tim û tim çavdêriya vegera
welatê xwe bikim. J ber ku ezê her tim bêriya bêhn û ta'ma axa xwe bikim.

Sitrana min, govend û çîroka min, rabûn û rûniştina min li welatê min
xweş e. Orf û adedên welatên xelkên din jî bê goman ji wan re xweş in.
Loma jî xweşî û bedewiyên welatên me bi hevra rengîniya dinya me ne.
Başî û xirabiyên me, xirabî û başiyên wan yek cîhana mezin e.

Li Başûrê min reşik û pirrengiyên di rojavayê Çîn û maçîn de Li Rojavayê
min nebiyên Zeus û Spartakus, eşqiyayên zeryayê. Nebiyên Mongolan jî
di navbera me de. Li Rojhilatê min şinge şinga tezbihên zar û zêçên Dehaq.

Erebiyên xwedî kum li jêr, li jor Kafkasî û Ûrisên zerik,
li dûr jî rengên cihê vê dinya me bedew dikin.
Welatê herkesî welatê wî, lê ev dinya milkê me
gişan e û rengîniyên me tevan jî cîhana me xweş dikin.
Çi ji vê xweştir heye?

## EZ Û TU

Ez hebûna xwe ji kûrayiya dil, baweriya qewîn, didime te û ji xwe re tevayiya poşmaniyê, hundakirina gelek tiştan û ji her tiştî zêdetir jî pirsên tejî naverok dihêlim.

Ji cîhana bêbinî hemî ronahiyê, stêrik û heyvên diberiqin ji te re pêşkêşî dikim û ji xwe re tariyê, nexweşî û birînên li dor jiyanê ji bo kuştinê xefk vedane dihêlim.

Av û hewa, xwarin û vexwarin, derman û saxî, evîn û hez bila ji te re pîroz bin, ji min re jî têrayiya wê hezreta dîtin û nêrîna te ku ji sedsalan e ji min hatiye stendin bes e.

Hêvî û xewnên ji bo te, şerr û şoreşên ku min bê rawestan di dirêjiya sedsalan de ji bo te dikir, bûne jiyaneke rast û ew jî tovê hebûna rengîn ya navê te di pêşerojê de ye.

## JÎN JI NUH DE GUL DIVEDE

Tu ji min weha dûrketî, ku meriv dibêje qey li
pey ronahiya rojê tariyeke gelekî piçûk û sivik î.
Yan li pey şeva tarî, mîna çirayeke pirr pirr zeîf
di ber tirsa tefandinê de li ber xwe didî. Hey wax.

Tu weha bênav mayî, di bin şermezariya giran
li ber çavê merovatiyê, bi êş, bi derd û kul.
Heta niha kesek nikarîbû hebûna te bineqişînî
ne bi xwîna te, ne bi dengê te û ne bi çeka te.

Tu xwediyê çend hezar sal jîn, çiya û çemên te
tev heval û dost ji merivên xwe yên sedsalan re.
Ewê ev xewn û xeyal di rojek ji pêşerojan de
bibe rastiya bê goman û jîn ji nuh de gul vede.

## KÎ ÇI YE ?

Dema dijmin li welatê min
dixwaze min bikujin
û mala min
û gundê min
û bajarê min
û kultûra min wêran bikin
bi navê xweparastinê dikin

Dema ez li welatê xwe
yê bindest û wêran
mal û gundê hejar
bajar û hebûna xwe
kultûra xwe ya rengîn
û jiyana xwe diparêzim
ji min re dibêjin terorîst

## GOTIN TÊR NAKIN

Mîna kulîlkeke pirr reng
li ber çavên min
lê tiştekî nikarim bêjim
ji ber ku gotin têr nakin
bêjim çiqasî bedew î

Hin tişt hene li vê jiyanê
meriv nikarê di gotinan de
weke dil dixwaze
binivîse yan bisitrîne
tu jî yek ji wan tiştê tenha yî

Stêrikeke geş li azman
kevokek belek li fira xwe
xezalek li berriyeke fereh
dîlbereke mîna te
gotin têrê nakin meriv bêje

## TARÎ Û RONAHÎ
## JI ME GIŞAN RE NE

Tarî ne qedera min e
mafê min jî
mîna te, yê din û yê din
ji ronahiyê re heye

Mirina berî mirinê ne qederê min e
mafê min jî
bio awayekî xweza û rengoreng
ji mirina paş jiyanekê re heye

Belengaziya can û malê dinê
birçîbûn û tazîbûna xedar
ne qederê min e
mafê min jî ji hemî xweşiyan re heye

Ev ronahî û tariya li ser serê me
ev xweşî û nexweşiyên di nava me de
ev şahî û şînên em tê de dijîn
divê em li xwe gişan par bikin

Ev bindestî ne qederê min e
mafê min jî
mîna te û yê din û yê din
ji azadiyê re heye, ji ber ku
ez jî mîna te û yên din hatime dinê

## PIRSA ME

Di pirsa me de pêwîst e
meriv di gotin û şîrovekirinê de
gelekî xurt û bi lez be
ku hê wê çarçewa xwe ne guhertiye

Di pirsa me de pêwîst e
meriv di avakirin û rastkirinê de
jîr û aza be, bê şik û bi goman
ku hê ji derve kesî pozê xwe ne xistiye nav

Di pirsa me de divê qedexe be
xênexwaz li ser doza me xwedî axaftin
û xêrxwaz di bêdengiyê de bimînin
ku çerxa feleka nedost li me venegerînin

Di pirsa me de divê em ne li ser ewran
lê li ser erdê doza xwe bidomînin
ne bi xeyal û xewnên şêrîn
lê paş êş û birînên dijwar serfirazî li benda mr ye

## GULÊN JIYANA BEDEW

Di doza azadiyê de
gerîlla, mîna gulên rengareng
ji nav bexçeyê jiyanê şîn dibin
weha xweşik, weha bedew

Ew hêviyên me ne
mîna çîçekên biharê
di pey baraneke nazik de
tijî jiyan û ji hebûnê re bi qerar

Ew hêstirên ji çavên me tên
û tev evîna sedsalan
li ser hinarkên sor dixindirin
bê deng, lê ji hesretê tijî

Ew mîna stêrikên li ezman
ku ji sedsalan û vir de
şahidê zora li ser axa min
ronahiyê dixe dilê merivan

Ew ronahî ye di nava me de
hezar kul û derd û êş
li ser bedena xwe pêça ne
ji bo bindestiyê bike azadî

Ew xwîn e li hawîrdorê welêt
ew nîşana hebûnê ye, bê eman
ew gula jiyana bedew e
di dilê me de mîna rojê bi qedir

## PENABER DI REVA XWE DE

Barê wan li ser milê wan
zarok in, kinc in, xwarin e
tirs û hêviya parêziyê ye
û şahiya jiyana nû ye

Barê wan roj bi roj sivik
kul û derd giran, pirs.
roj bi roj ji canê wan mezintir
û xewn û xeyal zêde dibin

Meriv ji zordariyê direve
ol e, reng e, esl e
bîr û baweriya jiyanê ye
û li ser eynî axê maf û bêmafî ye

Mala xwe tev hebûnê
li pey xwe dihêlin
erd e, ezman e, jiyan e, evîn e
û hemî stêrikên di tariyê de li jor in

Hêvî wan li jiyanê li ser piyan
daxwaz wan di gihiştinê de xurt dike
doza wan jî pêş de diçe
û rojên xweş, jiyana aza ji dûr xuya ye

Penaber di reva xwe de di nav hezar bîr
û xeman de, di nava dilê min de
li dermanekî digere û dilê min jî
bi hezar derd û kul li dermanê xwe digere

## AXA Û MERIVÊN ME

Binêr, li vî welatê kûrbirîn
gelek kes, ji bo hêviyan,
bi mirina xwe, bi axê re yek in

Ev ax, li ber mirina hewqas kes nakeve
dil naêşe, û binêre li derdorê
kes ji bo merivan hêstiran narijîne

Jiyana merivan, mîna hundabûyî
buhuşteke ji xeyalê, cehenemeke ji agir
bûyineke bê dil, mirineke ji dil

Dem û dewran, ax û jiyan, der û dor.
îro ji merivên me re dijwar in
ew tiştê sibe çê bibin, îro xera dikin

## ÇEMEKÎ JI MIN RE BINEQIŞÎNE

Çemekî ji min re bineqişîne
di nava newal û geliyan de
di qeraxê çiyan û bajaran de
ji nava daristanan bila biherike

Çemekî ji min re bineqişîne
ku evîn di nav ava hênik de
kulîlk di kêleka wî de bedew
û sosin ji nava dilê wî şah bibin

Çemekî ji min re bineqişîne
ku ji ta'ma av û bedewiya wî
hêviyên jînê mîna tîrêjên rojê
li derdorê xwe belav dibin

Çemekî ji min re bineqişîne
ji serî heta dawî gul li kêlekê
çûk li jorê di şahiya xwe de
û masî li navê seyranê dikin

Çemekî ji min re bineqişîne
bila îlhama wî ji Dîcle û Firat
rengê wî ji Xabûr û Wanê be
ku ez vegerim serdana wan

Çemekî ji min re bineqişîne
bila di nava milkê Kurdan de
ji Rojhilat ber bi Rojava biherike
û ji Bakur û Başûr jî gera xwe bike

Çemekî ji min re bineqişîne
ku li aliyekî keçên rengorengo
li aliyê din xortên bejin bilind
ji hev re li ser evînê diaxivin

Çemekî ji min re bineqişîne
ku navên şervanên azadiyê
di her quncikê de kolayî
û di her lepta avê de bê gotin

Çemekî ji min re bineqişîne
bila Zîna Zêdan li wî serî be
û Memê Alan li serê din
ku bîna wan ji hev re here

Çemekî ji min re bineqişîne
bila Feqiyê Teyran li ser textê xwe
di nava daristanê de bi awazê xweş
ji dîwana çûkan re sitranan bêje

Çemekî ji min re bineqişîne
ji bîna ava wî bîna milkê kurdan
ji rengê wî buhuşta Yezdanê Mihrîban
û ji dilê wî ronahiya rojê belav bibe

## LI WELATÊ ME

Li welatê me êş û derd
dizî û zor
kul û xem
kuştin û zîndan
tî û birçîbûn
dijminahî û nexweşî
tev serbest in

Li welatê me derman û xweşî
hevaltî û dostî
dibistan û azadî
têrbûn û şahî
kar û karmendî
evîn û merovatî
tev qedexe ne

Li welatê me mêrkuj û diz
çepel û şerrût
pêxwas û sextekar
namerd û bêbext
qewad û bêhempa
bê esl û fesad
tev azad in

Li welatê me xwende û zana
rast û mêrxas
maqûl û merd
canfeda û êmin
canfsivik û sexî
welathiz û milethiz
tev girtî ne

## DU GOTIN JI GERÎLLA

Ez vî şerrî dikim
    ji bo tiştên hunda
        hember hebûna bindest

Ez vî şerrî dikim
    ji bo evîna xwe
        nedim nav destê qedera tarî

Ez vî şerrî dikim
    ji bo di pêşerojê de aşîtî
        û evînê hembêz bikim

Ez vî şerrî dikim
    ji bo xirabiyê ji nava welatê xwe
        û namerdiyê ji nava xwînê dur bikim

Ez vî şerrî dikim
    ji bo azadiyê
        û dijî zora li ser milkê xwe

## EM: EZ Û TU

Em; ez û tu, bêyî hev nabin
serî bi serî, lêv li ser lêvê
mil bi mil, ceger bi kezeb
dil bi dil, xwîn bi xwîn
çav bi çav, dest di dest de
tev bi hev re xweş e

## BIHAR E

Bîst û yekê Adarê,
dest pê dike Bihar
û derdor rengareng
bi bîneke xweş dixemile

Di ber êvarê de çûk
di tariya şevê de sîsirk
di berbanga sibê de dîkê sor
bêdengiyê bi dengê xwe dixemilînin

Şînayî di bin tîrêjên rojê de geş
ax li ber baranê bi ber
dinya-alem bi eşq û kêf
û ez jî ji bo Newroza xwe şah im

## BAV Û KALÊN ME GOTINE

Dijminê Kurdan yên herî mezin
feqîrtî, cehalet û nexwendîbûn
dijminahiya nav hev û îhtîlaf

Hebûna Kurdan berdewam e eger
çand, dîrok û hisa kurdî
di nav gel de xurt bin

Ji me re lazim e xwendin
adalet, bînferehî û hevkarî
serê xwe jî bi destên xwerandin

Paş tariyê ronahî tê
paş şop û tofanê xweşî tê
paş bindestiyê azadî tê



**Derwêş M. Ferho**

Ji Mizîzexê, gundekî ji navçeya Torê ye. Di destpêka sala 1977 de ji welêt derket û ji hinga ve li Beljîkiqa dimîne.

Ew yek ji hîmdarê Enstituya Kurdî ya Brukselê ye. Niha jî serokatiya wê dike. Di sala 1983 de wî Enstituya bilind ya Rehabilitasyonê qedand.

Berhemên Derwêş M. Ferho: Dengê Roja Dîl (helbest), Destpêka Fêhrbûna Zimanên KurdîHolandî, Lied Der Aarde (werger), Cegerxwîn: Poîzie uit Koerdistan (werger), Binêr... ez mezin dibim (werger) û nivîsarên cihê di kovar û roj-nameyên kurdî û Beljîkiyan de.

D 1999 5799 24